

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :

* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 135) Sal 22 Cotmeh 2017 z - 2629 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S


# Mam Celal Talbanî... Jidestçûyê Gewre

**Desteya sernivîser**

Li roja Sêşemê 22017/10/an MAM CELAL têkoşerê Kurdistanê yê gewre û Serokê Komara Îraqê Çavên xwe damrandin, xatirê xwe xwast.

Mam Celal Talbanî li roja 12 meha Mijdarê li sal 1933an li gundê Kelkan li avraza Çiyayê Kosret- Kerkûk ji dayîk bû. Mam Celal li sala 1947an derbas nav rêzên Partiya Demokrat a Kudistanê bû. Li destpêka dehsalên pêncî ji sedsala bîstan li gel hevalên xwe Yekîtiya Qutabiyên Kurdistanê ava kir. Li sala 1951an ji bo endamê komîta navendî ya partiyê hat vebjartin, û ji ber ku ew ji çûkaniya xwe de jîr û jêhatî bû hevalê û nasên wî bi nasvavê MAM Celal didan nasîn.

Mam Celal li sala 1953an derbas kolîcja mafnasiyê li zanîngeha Bexdayê bû û li sala 1959an xwendina xwe bi dawî kir.

Li sala 1961an, piştî ku destladarê Bexdayê ji sozên xwe ji bo mafên Kurdan bi cih nanîn, Mam Celal tevlî rezên Şoreşa Êlûnê bû û bû serkirdeyê beşekî mezin ji pêşmergeyan li deverên Kerkûk û Silêmaniyê.

Li sala 1963an Mam Celal li ser biryara serkirdeya partiyê û Rêberê şoreşê Mile Mistefa Barzanî bi……… 2






## Roja Helbesta Kurdî li Rojava

Li roja 22ê Cotmehê, roja helbesta kurdî di kopiya xwe ya 25emîn de li şanogeha Şehîd Rûken li bajarê Efrînê di bin diruşma (helbest çîkdana azadiyê ye) hate lidarxistin.

Di Mehrecanê de panzde helbestvan bi peyv û xeyalên xwe, hizr û bîra bi dehan ji evîndarên helbest û zimanê kurdî li ezmanên helbestê gerandin.

……….4



## Pakrewanên Gelê Kurd bi Coşeke Mezin Hatin Pêşwazîkirin




« Şehîd Rodî Emo »

Di cenga giran de ku li roja 25 Cotmehê di navbera Pêşmergeyan û Heşda Şe`bî de li eniya Rovaya Çemê Dicle rabû, hejmarek ji pêşmergeyan jiyan xwe ji dest dan û bûne qurbaniya welêt û axa wî ya pîroz.

……….5

# Dabeşkirina Bi Mebest!




**Mislim Şêx Hesen**

Li sala1916 an Kurdistan bi awakî gelekî bi mebest di navbera çar welatan de hat dabeşkirine, mebesteke wan jê ew bû, ku pirsa kurdî bibe pirsgirêk û nakokiyeke azirî ji gelên Rojhilata Navîn re, careserî zû bi zû jê re peyda nebe û karibin jî bi dirêjtirîn dem ji samanên kurdistanê wek sotemenî, av û HWD sûdê wergirin. Lewra jî ew tu careseriyê ji rewşa kurdistanê re peyda nakin, û li hev dicivin ku pirojên kurdan bo azadî û rizgariyê têk dibin. Di vî warî de bidehan pîlanên hevbeş li dijî gelê kurd û daxwazên wî hatine gerandin û dubare jî bûne.

Her wiha li dema dawiyê welatên dagirker piştî giştpirsiya ku li kurdistana Îraqê hat li dar xistin ku li gorî zagon û belgeyên netewe yekbûyî bû, wan dewletan, ji bo ku encamên giştpirsiyê tine bikin, tavilê nakokiyên xwe dan tenştekê û ligel hev sê qulî û çar qulî wek demên borî li hev civiyan.

Vêça, divê tevgera siyasî ya kurdistanî lêvegereke rasteqîn û dîrokî ji xwe re bike û li ser kiryarên kirêt ên dewletêm zorker rawestin. Çawa ku ew dewlet bi hêsanî karin dev ji nakokiyên xwe berdin, li ser doza gelê kurd lihevbikin û li pêşiya daxwaz û hêviyên gelê kurd rawestin, tevlî ku netewe, ziman û dîroka wan jî ne wek heve, divê tevgera kurdistanî jî sûdê ji wê rastiyê bigirin û siyaset û stratîciyeke hevbeş dînin û bajon, çimkî tu çûdahî û nakokiyên mezin di navbera tevgera kurdistanê de nîn e, û li dawiyê em miletek in, û tevgera me ya netewî li herçar parçeyên kurdistanê gerek e rojekê pêş de li hev bike û yekrêziya xwe ya siyasî ya netewî damezirîne. Lewre jî hazirî û amadebaşî ji bona lidarxistina kongirekî netewî erk û mafekî rewa ye.

---

**Gişpirsî ... Dûmahîk**

seredanekê çû Misirê û hevdîtin bi serokê Misirê Cemal Ebdinasir re kir.

Piştî girêbesta Cezaîrê a sala 1975an di navbera Şahê Îranê û cîgirê serokomarê Îraqê Sedam Husên de û têkçûna Şoreşa Êlûnê, Mam Celal li gel çend hevalên xwe Partiya Yekîtiya Niştimanî Ya Kurdistanê ava kirin û ji nû ve dest bi şerê çekdarî li dijî rijêma Be`is ya Îraqê kir.

Li sala 1991ê, piştî şerê Kendavê yê yekem, pêşmergeyên Kurdistanê Herêma Kurdistana Îraqê rizgar kirin, û bi rêbertyia Mam Celal Talbanî û Mesûd Barzanî federaliya Kurdistana Îraqê ragihandin.

Piştî şerê kendavê yê duyem li sala 2003an, dagîrkirina Emerîka ji Îraqê re û avakirina hukumraniya demkî li Bexdayê, Mam Cela wek serokê komara Îraqê hate vebjartin, piştre jî li sala 2006an di perlemana Îraqê de wek serokomar hat hilbijartin û li sala 2010an dîsa hat hilbijartin. Lê li sal 2012an, digel ku tûşî nexweşiyê bû, dîsa jî ta sala 2014an poste serokmariyê di destê wî de bû.

Di wê navberê de, Mam Cela li sala 2008an wek cîgirê serokê Rêxistina Sosyalîst a Navndelewtî hat hilbijartin û ta dawiya temenê xwe post parasti bû.

Mam Celal Talbanî yek ji gewretirîn rêberên siyasî yên Kurd û Îraqî bû. Ji destpêka salên şêstî de ji sedsala bîstan û ta roja dawîn ji temenê xwe, roleke wî ye mezin û bernas di bûyer û dîroka Êraqê û xebata gelê Kurd û Kurdistanê de hebû.

Roja koçkirina wî rojeke xemgîn bû li seranserî Kurdistan û li ba hemî qad û nof û tevgera siyasî ya gelê Kurd. Gelek kesayetiyên nas û navdar di rêwresmên veşartina wî de amade bûn û paye û rola wî ya giring dane nasîn.

Ji bo wê êşa giran û boneya kovan, sekretêrê partiya me ev birûska serxweşiyê ji hevalên Mam Celal re hinart:

***((Birader, endamên nivîsgeha siyasî ya Yekîtiya Niştimanî Kurdistanî ya bira…***

***Silav û Rêz … Em bi dilekî xemgîn ji bona goçkirina sekretêrê giştî yê partiya we û lawê gelê Kurd ê zor hêja mamoste Celal Talbanî serê we xweş dikin. Wekî ku tê zanîn, wî wek têkoşerekî bê dudilî û bê rawestan jiyana xwe di warê têkoşîna ji bo azadî û dadmendiyê borand. Ew bi hezkirin û rêzdariya bi milyonan law û keçên gelê Kurd û gelên herêmê û cîhan bextewer bû.***

***Me baş nas dikir û çiqas Mam Celal ji bo belavkirina zanîn û zanistê li hemî xelkê Kurdistan û Êraqê dilniyaz bû. Wî bê cudawazî berevanî di ber mafê mirov de dikir. Bê dudilî alîgirê aştî û guftûgoyê bû. Bi goçkirina mamosteyê gewre Mam Celal Talbanî gelê Herêma Kurdistanê û hemî Êrqiyan rêberekî siyasî î gewre ji dest da, wekî ku ew ji destê hemî Kurdan li seranserî Kurdistan û diyasporayê çû.***

***Em serxweşiya xwe ya ji dil de dubare dikin, di riya we re û bi navê Partiya Yekîtiya ya Demokrat a Kurd li Sûryê, serê endam û piştgirên Yekîtî Niştimanî Kurdistan, kesên malabatê û hemî dost û hezkiriyê jidestçûyê gewre Mam Celal xweş dikin.***

***Bimînin di xweşiyê de.***

**Birayê we**

**Mihyedîn Şêx Allî**

**Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demoktrat a Kurd li Sûryê (Yekîtî).**

Nêrîna Azad

# Çima Têkçûn?



**Merwan Berekat**

Carina mirov xewnên xwe li gor daxweza dilê xwe diçêrîne û dixwaze kesine din jî jê re bibêjin: Xewna te rast e û dest jê bermede. Lê pir kesên ku di xewnên ji xwe mezintir de diramin û dixwazin di riya wan re xwe bibînin, li dawiyê ew dibin xewnine derewîn û dîrok wan kesan dixe berîka tinaziyê.

Di siyasetê de nihênpakbûn nîşana sernekeftin û poşmaniyê ye, herweha doza azadî û rizgarkirina gelan jî bi berger, lome û hêviyan bi ser nakeve. Dema ku dijmin baş netê naskirin û dîroka wî ya dijîtiyê bê jibîrkirin, têkbirina wî dijwar û zor dibe. Lê belê ne tenê dijmin û neyar dibin sedema têkçûna şoreşên gelan.

Di sedsala bîstan de gelê Kurd bi dehan şoreş û serhildan rakirin, pir caran jî pişt li dijminan şikandin û ji armanca xwe ve nêzîk dibûn, lê mixabin piraniya wan şoreş û serhildanan bi destê hin Kurdan têkçûn. Bêguman tevahiya siyasetmedarên Kurdan vê yekê baş dizanin, lê tiştê seyer ew e, çima naxwezin sûdê ji dîrokê wergrin û şaşbûnên kujer dubare dikin?

Gelê Kurd xwedî vîneke xurt e û tucarî zincîra şoreşên ji bo rizgarin û azadiya xwe û welatê xwe ji hev neqetiye û ne jî vîna wî lawaz bûye. Vêca çima em bi ser nakevin û têra xwe qurbaniyan didin? Gelek sedemên wê hene, lê yên sereke ev in:

1 - Çendî nakokî, dijmantî, şer û lihevnekirin di navbera dijmin û neyarên Kurdan de hebin, dema ku pirs û azadiya gelê Kurd tê meydanê, ew wan tiştan tev didin aliyekî û li hember kurdan dibin yek. Di vî warî de gelek nimûne hene û Başûrê Kurdistanê û Rojavayê wê li ber çavan e.

2 - Di firkên nazik û hestewar de û li hember wê lihevkirina neyaran li ser Kurdan, tevgera siyasî ya kurdî yekrêziya xwe ava nake û carina jî li dijî hev kar dikin. Ji wê xerbtir; ji bo berjewendiyên kesayetî û siyasî yên teng dilê xwe li hev xweş dikin û li dawiyê dilê neyaran bi wan hemiyan şa dibe.

3 - Di warê diblomasî de, lawazbûneke herdem hebûye û nikarîbûn dostine dilsoz ji doza kurdî re peyda bikin. Eger carina çêbûye jî, lê ne dostine stiratîjîk in. Yanê dema ku Kurd ji armancên xwe ve nêzik dibin, ew dostina pişta xwe didin Kurdan û wan bi tenê dihêlin.

Di vê demê de jî derfeteke zor baş ji gelê kurd re lêhatiye ku wek hemû miletên cîhanê bigihînin azadiya xwe û kul û derdên wan kêm bibin. Lê mixabin tevgera siyasî dîsa belawela maye û her aliyek dibêje ya min rast e. Yanê serborî ji dîrokê nehatine wergirtin û her aliyek an partiyek li gor berjewediyên xwe yên teng xewnên xwe diçêrîne.

# Sûrya Wêrankirî û Nakokiyên Berjewendiyan!

**Dr. Rozad Elî**



Piştî heft sala ji şer û cenga giran, mirina dora nîv milyon mirov, birîndarbûna bêtirî milyonek kes, awarebûna nîvê şêniyê Sûryê, wêrankirina gund, bajar û damezrawên bingehî, piştî van hemî bobelatan, destên ku dirêj nav xwîna Sûryan bûne, dixwazin vî şerî bi dawî bikin û sûd û berjewendiyan ku çavên xwe lê bûn li hev parve bikin.

Bê guman, şer û pevçûn wê sivik bibin û belkî rawestin jî, lê keftleft û nakokiyên siyasî, ango şerê sar wê di navbera aliyên qeyranê de ranewestê, nemaze jî di navbera dewletên ku yekser destên xwe xisti bûn nav qeyranê, ew gur dikirin û ji nêzîkî ve bi pirsgirêkê re tekildar bûn.

Çinkî dewletên mîna Rûsya, Emerîka, Îran, Tirkiye, Siûdiyê, Qeter û bilî wan jî, ewqas buhayên diravî û canî ne ji bo ((çavên sûryan ên reş)) dane û didin. Ew ji bo serweriya xwe li ser hukumraniya dewleta Sûryê, samanên wê û taybetiya wê ya ciyosiyasî tevdigerin û nexşeyan dihûnin.

Wekî ku ji danûstandinên navdewletî ku ji bo pirsa Sûryê tê nasîn û ji helwestên wan bîn dibe, her du dewletên Erebî ango Qeter û Siûdiyê dixwazin helwestên xwe yên taybet li derbara sazûmana Sûryê biguhêrin, destê xwe ji nav qeyrana Sûryê bikşînin û çareseriya dawîn ji Rûsya û Emerîka bihêlin. Lê belê her du.........

7

# Tevlêbûna Hilbijartinên Encûmenên Xwecehî ... Erk û Stubarî Ye

**Memê Alan**



Piştî ku pêngava yekemîn ji hilbijartinên hevserokatiya komînan li 22/ heyva Rezberê bi awakî erênî bi rêve çû, komîseriya bilind a hilbijartinan 1.12.2017an li şûna 3.11.2017an ji bo hilbijartinên encûmenên xwecihî (bajarok, dever, kanton) ên sîstema Federaliya Bakurê Sûriyê (F.D.B.S) ragihand. Ev pêngava hilbijartinê, pêngava diwemîn e. Di vê pêngavê de çar encûmenên xwecihî têne dagirtin; jê sê encûmen (bajarok, dever û kanton) bi riya hilbijartinên yekser, û encûmena navçeyan jî bi riya nûnerên encûmenên bajarok û deveran têne dagirtin.

Encûmenên xwecehî yên bajarokan ji (38) endaman, yên deveran ji (42) endaman û yên kantonan jî ji (62) endaman pêk tên. Herweha komîseriya bilind a hilbijartinan 17.10 ta 31.10. 2017an ji bo berendamkirinê (navdayînê) diyar kir.

Vêca, çendî xelkê Bakurê Sûriyê bi hemî pêkhateyên xwe, bi taybetî jî gelê me yê Kurd ji van hilbijartinan ve nêzîk bibin, û bi berendamdan, dengdan û peydakirina asa û aramiyê tê de beşdar bibin, ewqas derfetên serkeftina vê pêngavê pirtir dibin û rê li pêş pirojeya F.D.B.S vedibe ku bi serkeve.

Ne tenê weha, biserxistina vê pirojeyê li Bakurê Sûriyê rê li pêş çareseriya giştî ji kirîza Sûriyê re –pirsa kurdî jî di nav de- dûz û hêsan dike. Yanê em kanin bibêjin serkeftina vê nimûnê bo xelkê Sûriyê bi tevayî û gelê Kurd bi taybetî qezenc û deskeftiyeke dîrokî û zêrîn e. Ji ber ku, cîbicîkirina wê wek sîstemeke nenavendî li Sûriyê, yanê dûrketina ji navendbûnê, xelasbûna nişteciyên wê ji zilim û zorê û gendeliyê ye, parastina yekbûna xaknîgariya wê ye -ne weke hin dixwazin wê weke pirojeyeke perçekirina Sûriyê bi nav bikine-, parastina mafên hemî kes û pêkhateyan e û mafên miletê me yê Kurd jî di nav de.

Ji ber girîngî û sûdeweriya vê pirojeyê ji bo Bakurê Sûryê bi taybetî û Sûriyê serûber, em ji xelkê xwe re dibêjin tevlêbûna van hilbijartinên encûmenên xwecihî erk û stubariya me tevan e û zor pêwîst e ku ew bi serkeftî bi dawî bibin.

# Roja Helbesta Kurdî li Rojava

**Mihemed Bilo**

Di bin bandora bûyerên bi êş ku li herêma Başûrê Kurdistanê radibin de, bi taybetî jî li dilê Kurdistan (Kerkûk), û di rewşa dorpêçkirina herêma Efrînê û gefûgurên dewleta turkiyê li dijî wê de, li roja 22ê Cotmehê, roja helbesta kurdî di kopiya xwe ya 25emîn de li şanogeha Şehîd Rûken li bajarê Efrînê di bin diruşma (helbest çîkdana azadiyê ye) hate lidarxistin.

Di Mehrecanê de panzde helbestvan bi peyv û xeyalên xwe, hizr û bîra bi dehan ji evîndarên helbest û zimanê kurdî li ezmanên helbestê gerandin.

Tiştê balkêş ew bû, ku rewşa bajarê Kerkûkê, birînek kûr di wijdanê gelê kurd de vekir, loma jî piraniya helbestan di gola êşa bajarê Kerkûkê de avjenî kirin.

Wek girdişeke salane jî, komîta amadekar a mehrecanê li herêma Efrînê helbestvan û nivîskar rêzdar Nîdal Yûsêf xelat kir.

Nîdal Yûsêf di sala 1972an li gundê Çeqelê Cûmê yê bi ser navça Cindirêsê ve ye jidayîk bûye. Ew xwediyê çar



berhevokên helbestî yên çapkirî ye û herweha du pirtûkên din di warên ferheng û kelepûra Efrînê de dane çapê.

Hêja ye em bi bîr wînin, ku yekemîn mehrecana helbesta kurdî li Sûryê, bi boneya roja koçkirina helbestavanê gewre Cegerxwîn li 22ê-10-1993an li keleha Nebî Horî li devera Efrînê hate li darxistin û helbestvanên ji hemî deverên kurdî ên rojava lê beşdar bûn. Lê mixabin, ji ber sedemên dijwariya çûnhatinê li seranserî navçeyên kurdî li Sûryê, îsal her devereke kurdî bi serê xwe vê rojê li dar dixe. Spas ji bo Komîta Amadekar û Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê.

# Di Zewacê de, kî biryarê dide?!

**Îlham Osman**



Xewna her keçekê ye ku bedena xwe bi fîstanê spî bixemilîne û jiyaneke nû bi dildarî bidomîne. Ew temenê ji zarokatiyê ta qonaxa keçîniyê de dixe çenteyê bîranînên giranbuha û bi şahî, kêfxweşî û evînî jiyana zewaciyê pêşwaz dike. Bêguman malbat pê re dibe alîkar, ta ku biryara verêkirina cihê jidayîkbûnê û hembêzkirina “hêlîna zêrîn” rastir û ji dil de be.

Lê carina hin dê û bav astengan peyda dikin û bi şadî û pêşeroja keça xwe dileyzin!!! Berî ku keç bigihêje temenê zewacê, bêguman li ser destên dê û bavê xwe perwerda rast dibîne û sinciyên pak di giyanê wê de diçînin, rastî û şaşîtiyan ji hevdu derdixîne, ji şîretên wan zanînê dimêje, kesayetiyên keçan kêlî bi kêlî li ber çavên malbatê xurt dibe û qalib digire. Lê pirsek xwe ferz dike; gelo çima malbat nînika hêviyên keçan dişkînin?!

Li ser danîştekên xwendinê, têkliyên keçikê bi hevalan re, şopandina teknolojî û guherînên şêwaza jiyanê ji nifşekî ta nifşekî din û pir sedemên din, nêrîn, bawerî û pilanên nû di kesayetiya keçê de şax didin. Lewra cudatî di navbera her duyan de, ango keç û dê û bavê, derdikeve, bandora wê yekê jî ta di biryara zewaca keçê de diyar dibe. Ango keç dikare razîbûna xwe bi azadî bibêje. Lê malbat pir caran wê dixe bin zaxtê û zewacê bi aliyên aborî, malbatî û çînî ve girê dide. Mixabin, belkî bilindbûna rêjeya jihevberdanê ji encama van aloziyan be.

Bêguman şoreşa Sûriyê pir arîşeyên dijwar peyda kirin û em di tevliheviyê de noq bûne, aramî di giyana me de winda bûyê, kambaxiyên giran her roj mejiyê me diçeliqîne...

Divê em li keçên xwe guhdar bikin, baş nêrîna wan nas bikin, çinkî li dawiyê, jiyan jiyana wan e û ew di ber de berpirsiyar in. Jiyana rast ji bingehê de dest pê dike, bila rastî, rêzdarî û bêtirsî bingeha avakirina jiyaneke nû be û bi erêkirina hemû aliyan be.

# Pakrewanên Gelê Kurd bi Coşeke Mezin Hatin Pêşwazîkirin

Di cenga giran de ku li roja 25 Cotmehê di navbera Pêşmergeyan û Heşda Şe`bî de li eniya Rovaya Çemê Dicle rabû, hejmarek ji pêşmergeyan jiyan xwe ji dest dan û bûne qurbaniya welêt û axa wî ya pîroz. Pakrewan ev bûn:

Îvan Mihemed Xelî û Cemal Mihemed- Dêrina Axê... Gulhat Hacî Şêxî, Mihdî Salih Silêman û Elî Newaf Resûl- Dêrîk... Aldar He was– Amûdê... Rodî Emo Dirbêsiyê... Ebdilhenan Henan- Efrîn gundê Upila.



Darebestên wan pakrewanan bi rêwresmên xemgîn û moralên bilind ji ji hêla girseyeke mezin ji xelkê me yê Kurd de li Cizîrê hatin pêşwazîkirin. Wan tekez kir ku ewê ji ber axa welêt ve bi her şêwe û xwîna xwe ber xwe bidin, ala azadiyê wê ji destê wan danekeve û li ser şopa pakrewanan bimînin.

Ji nav pakrewanan hevalê partiya me Rodî Salih Emo li gundê wî Qereqoyê-Dirbêsiyê hate veşartin, û Endamê rêvebirya partiyê heval Fehid gotineke watedar li ser gorê kir. Bimire çavsorî û nijaperstiya neyarên azadiya gelê Kurd. Dê berdewam be xebata têkoşerên me ji bo azadî, wekhevî û aştiyê!

# Dan û Standina Erênî Bi Tenê Pêşxistinê Çênake

**Qaziqlî Mihemed**

Weke tê zanîn, sazûman û sîstemên rêvebirina welat û herêman li cîhanê pirereng û pircûre ne. Hin demkî û hin demdirêj in, hin rewa û hin ne rewa ne, hin demokrat û hin ne demokrat in, hin diktator, hin perlemanî ne, hin federal û hin konfederal in…û h.w.d. Rengê sazûmanê çi be û li kûderê be, herdem ji tevlîhevî û serberdayî çêtir û baştir e. Ji ber ku, sîstem –çêxerab- valahiya asayî û rêvebirî ya civakê dadigire, jiyana xelkê diparêze û pêdiviyên wan ên rojane û aramiyê kêm- zêde peyda dike.

Vêca, di welatên ku şerên navxweyî di nav de radibin û di qeyraneke xwînî re derbas dibin de, hebûna rêvebiriyên xwecehî pir girîng û ferz dibe, û ji hemî xelk û pêkhateyên wê derê tê xwestin ku lê xwedî derkevin û jê re palpişt bin, da ku wê bi pêş bixin, dewlemend û nûjen bikin.

Di vî warî de, emê herêmên kurdî li Sûriyê (Efrîn, Kobanê, Cezîr) piştî vekişîna rijîmê jê û lişûnxwehiştina valahiyeke asayî û îdarî û ragihandina Rêvebiriya Xweser a Demokratîk a demkî -weke pêdivî-, û aniha jî piroje cîbcîkirina Federaliya Demokratîk li Bakurê Sûriyê- Herêmên kurdî jî di nav de- ji aliyê Encûmena Sûriya Demokratîk ve weke nimûneyeke balkêş berçav û şirove bikin; ka çawa gerek xelk û pêkhate bi van rêvebirî û sîstemê re bidin û bistînin? Erênî bin an neyênî bin? Li gel bin an li dij derkevin? Hewil bidin bi pêş bixînin, dewlemend û nûjen bikin, an wê bi şûn bixin û lawaz û têk bibin? Ka kîjan ji me re çêtir û baştir e?

Weke xuya dibe, hinek diparêzin û hinekan kar û barê xwe berdane û dijberiya wê dikin û hewil didin ku çawa di siya behaneyên curbecur de lawaz bikin û têk bibin. Hinek jî alîgir in û erênî vê re didin distînin û xwe ji şaşbûn û kêmasiyên hene bi dûr dixin, bi sedema ku di vê rewşa zor hestiyar de bila tu tevlihevî çênebin, alozî pir nebin û nakokiyên sereke neyêne ji bîrkirin. Hinek jî hene dibêjin rast e, gerek em di vê rewşa nazik de- ta ku ji me were- em erênî bin û jê re alîgir û palpişt bin, lê da ku em kanibin vê rêvebirî û sîstemê bi pêş bixin, gerek em li ser şaşiyan xew nekin û bêdeng nemînin, bervajî wê ger em rast xêra vê rêvebiriyê dixwazin, gerek bi hezkirin û dengekî bilind û biratî pêçiyên xwe dirêjî şaşîtiyan bikin da ku em rê li pêş gendelî bigirin, û ev sîstem bibe nimûneyeke ronak ji bo xelkê.

De ka em bi hev re bi van nêrînan mijûl bibin, ma kîjan ji van nêrînan bêtir wê bi kêrî pêşxistin û nûjenkirina vê rêvebiriya me ya heyî were. Di baweriya me de, dan û standina erênî baş e, lê belê ji bo pêşxistin û nûjenkirinê bes e û bi kêr nayê. Ger bi rastî em dixwazin rêvebirî û sazûmana heyî pêşde bidin, bi hêz û bi awakî erênî çalak bikin, baweriya xelkê me bêtir pê were û ji xelkê Sûriyê re bi tevayî û ji dûr û nêzîk re bibe mînakeke baş, divê em hemî bi hev re lê miqate bin, û li ser şaşiyên ku dibin xew nekin, da ku nebin nexweşî û rûdawên metirsîdar û bê çare û derman bimînin.

# Pakrawan... Şana Dilsoziyê û Jiyaneke Bi Rûmet In

**Nazdar Hesen**

Bê guman, tiştê herî şêrîn û giranbuha li ba mirovan jiyan e. Ji ber ku jiyana mirov ne sermedî ye. Ta roja dawiyê di dilê wî de eşq û evîna jiyanê venamire û destê wî ji jiyanê nabe; ev jî di xweristiya her zîndewarekî de diyar e. Lê dema ku zilim, destdirêjî, kedxwerî, şer û pevçûn li cîhanê belav bû, kesên dilpak û dilsoz ev rewş ne pejirandine, ji bo feryada welêt û mafên mirovahiyê bê dudilî berxwedanî kirine, can û jiyana xwe dane ser û borandine, ne ji bo ku jiyana sermedî û (bihuşta rengîn) cihê wan be wan ew têkoşîn kirin, ji bo baweriyeke rastîn xebat kirin û dîtin ev nameyeke mirovane û erkeke niştîmanî ye li ser milê wan, û girîng e ku axa welatê xwe rizgar bikin, biparêzin û aştî û hêminyê jî belav bikin.

Belê pakrawan ew kesên herî dilsoz in. Ew jiyana xwe disotînin û bi dawî dikin ji bo ku kesên din di jiyaneke bi rûmet de bijîn. Ew kesên herî pîroz in, bi xwîna xwe axa welêt av didin û bi saya fedekariya wan welat ava dibin. Ji ber wê jî hemû gelan bi hezaran pakrawan dane. Gelê me yê kurd jî yek ji wan gelên herî fedekar e, ku bi pakrawaniya keç û xurtên xwe destan afirandine û qehremaniya wan di dîrokê de tê tomar kirin, pakrewan Arîna Mîrkan jî yek ji wan qehremanan bû, ku canê xwe kir fedekariya Kobanê û hemî welatê xwe. Kobaniya ku di bin nîrê çeteyên Daiş de dinalî, bi pakrawaniya wê û hevalên wê ber xwe da û bi ser ket.



Ji ber ku pakrawan şana dilsoziyê û fedekariyê ne û jiyaneke bi rûmet dafrînin, ev cangoriya jî li ba her kesekî peyda nabe, wê herdem di dilê gelê xwe de zindî bin û cihê serbilindiyê û şahnaziyê bin.

**Sûrya Wêrankirî ... Dûmahîk**

dewletên din Îran û Tirkiyê di destêwerdana xwe de berdewam in û ji armanc û berjewendiyên xwe danagerin; çinkî her dewletekê ji wan, pilan û berjewendiyên xwe yên dûrûdirêj di herêma Rojhilata Navîn de hene, û bi giranî kar dikin ku wan pêk bînin û biçespînin.

Îrana (welî el feqîh) daye ber çavê xwe û dixebite, da ku zincîra xwe ya Sefewî-Şî`î bigihîne Derya Sipî û pilan û armanca xwe ya dehsalan sergihayî bike.

Tirkiya (toranî-Sinnî) jî bi her awakî pêkol dike, da ku xwe bike (rêbera gerdûna îslamî) û dîroka Osmaniyan vegerîne. Lewre jî serekomarê Tirkiyê R.T. Erdoxan di her gotareke xwe de li ser zaro û xelkên xizan ên welatên îslamî mîna Somalê, Rohînga û bilî wan jî digirî, xwe dike bavekî dilovan û mîna (bavê Ummeta Mislimanan) xwe nîşan dide.

Ji bilî wê pirsa borî, tirkiyê wekî ku bi ser xewnekê ve bûye, çinkî wê bawer ne dikir ku Rûsya wê bi hêz derbas Sûryê bibe, rê li ber pêlanên Tirkiyê bibire û terezûya qeyranê li gora berjewendiyên xwe û sazûmana El Be`is biguhêre.

Wê hîç guman ne dikir jî, ku rola Kurdên Sûryê wê di heyama qeyrana Sûryê de mezin ewqas fere bibe, Kurd wê hêzên leşgerî ava bikin, %25 ji nexşeya Sûryê têxin bi destê xwe, Rêvebirya Xweser damezrînin, doza Federaliyê bikin, Emerîka jî wê Tirkiyê berde û pişta wan bigire û hîn Rûsya jî ji wan re bibe palpişt. Ango, pêşdeçûna pirsa kurdî Tirkiye veciniqand û ji xewna şêrîn ku tê de bû şiyar kir. Wê ûştê jî, wê xwe di şev û rojekê de guhert, û piştî ku eşkere alîkariya hêzên teror dikir, ala şerê li dijî terorê rakir û di şev û rojekê de (DAIŞ xwe) ji Bakurê Helebê derxist!

Bê guman, roja îro û berê jî, mebesta Tirkiyê ya rastîn ne şerê DAIŞê û terorê ye, armanca wê ya tekûtenê ew e, ku rê li ber hêzên kurdî bibire da ku navçeyên kurdî li Bakurê Sûryê têxe bin gefa xwe û negihêne hev. Wek tê gumankirin, ev armanca Tirkiyê li heza destlata Sûryê û bilkî dilxwaziya Rûs û Îraniyan jî tê; çinkî ew sê dewlet ji wan li dijî mafdariya doza kurdî ne, û Rûsya jî qerezdara Emerîka ye li Sûryê, guman heye ku wê lomê jî Tirkiyê bi hemî daxwazên Rûs û Îraniyan qayil dibe. Ji ber ku ew nexwaze ji Sûryê derkeve û Kurd tê de bûne xudan qewareke(kiyan) siyasî û mafên xwe yên netewî bi şêweyên destûrî bi dest xistine. Û ji ber ku Emerîka û Rûsya li meydanê hene, ew nikane yekser hêriş deverên kurdî jî bike. Lewre ew neçar bûye, bi Rûsan re hevsengiyê(tensîq) ava bike, pişgiriya gelek rêxistinê çekdar berde, di civîn û kongirên ku ji bo Sûryê tên girêdan de beşdar bibe, kaxezên pêwendiyên xwe bi rêxistinên teror re daxe bazarê û berdêlan li ser hesabê mafê Kurdan bixwaze. Belkî sedema ku Tirkiyê doz li hinek rêxistinên rikberiyê kir ku di kongira Himêmîmê û Sotçî de beşdar bin, ew e ku Kurdan bi tenê bi Rûsan re nehêlin, ew kaxezên Tirkiyê li şûna wê li ber masan vekin, li dijî pirojeya federalî, xweserî û nenavendiya Sûryê biskin û mafên Kurdan jî di ti destûran de tekez nebe.

Lê li aliyê din, Tirkiyê baş dibîne ku rewşa rikberiya siyasî û leşgerî ya Sûryê çawa bûye, ketiye çi deraqekî û gihîştiye kîjan rewşê. Baş dibîne jî, ku hêza çakdar ku li ser zemînê maye û baweriya her du dewletên mezin Emerîka û Rûsya pê dibe, hêza YPG û QSD ye, eger nîr û merc jî wilo berdewam bikin, Kurd wê li Sûryê bibin xudî paye û qewareke siyasî jî. Belkî ji ber wê rastiyê helwesta Tirkiyê û Îranê li hember rewşa Kurdistana îraqê tûjtir û hişktir bû û kîna xwe rijandin.

Loma jî, di van rewşên pir nazdar û dîrokî de pir giring e ku her kurdek xwe li kêleka hêzên YPG, saziyên Rêvebirya Xweser û pirojeya federaliya Bakurê Sûryê bibîne, lê bibe xwedî û wan ji pilokcî û xêrnexwazan biparêze.

**Rapirsî ... Dûmahîk**

pêk were, dewletên ku li cîhan serdar in li îmze û gotinên xwe xudî derkevin û ji gelên bindest re bibin pişgirên rastgo û durust.

Ew bertek û helwestên tund ku li hember rapirsiya serxwebûna Kurdistana Îraqê derketin, dîsa mêlag(tekîd) kirin, ku gelek tişt, helwest, kirde û siyasetên ku ji sed salî li derbarê doz û mafên gelê Kurd hene û têne meşandin, hîn li cihê xwe ne û hîn li dar in. Belkî ew kirdeyên sereke jî ev bin:

- Digel hemî guhertinên navxweyî û derdorî ku li dirêjiya dehsalan çêbûne, û qurbaniyên ewqas mezin ku gelê Kurd dane û hîn jî dide, mixabin tevger û gelek serkirdeyên me hîn bi hişê malbatî, hozî û ezîtî û h.w. diramin û dixebitin, nikanin li ser doza gelê xwe li hev bikin û bi rengekî ne hemdemî, pir teng û lişûnmayî bi rewş, hêman û guhertinên serdema nûjen re didin û distînin.

- Dewletên ku Kurdistan di nav wan de parkirî ye jî, ew jî bi hişê serdemên berî sed salî diramin, bi regezperestî û şovenîtiyeke beloq û sexte bi doza gelê Kurd re didin û distînin, ne amade ne ku bi çav û hişekî nûjen û hemdemî rastiyan bibin, ji helwest û siyasetên xwe yên nijadperest û nankor d dagerin û li mafên gelê Kurd yên rewa û li serxwebûna wî mikûr ne tên.

- Digel ku dewletên mezin di rû re doza pêkanîn û parastina dad û wekheviya mirov û gelan dikin û xwe wek parêzvanên demokrasî, wekhevî û azadiyê dibînin, lê di rastiyê de, berjwendiyên xwe di ser û di pêş her soz û peymanekê re digirin, pir bi hêsanî zagon û rewangîriyên navdewletî binpê dikin û di ser re gav dikin.

Zor pêwîst e ku tevger, hêzên siyasî û serkirdeyên gelê Kurd bi helwest û nêrînên rastedar li rewşa gelê xwe binêrin, wî ji xişm û bobelatan biparêzên û riya xebatê jî li pêş rast û durustir bikin.

# Nivîskar û Lêkolînvanê Navdar

## Kerîn Zend Çû Ser Qedera Xwe



Li roja 10ê Cotmehê 2017an, mamoste, dîroknivîs, rewşenbîr û kesayetiya niştimanperwer û mirovê nasraw Kerîm Selîm Zend çû ser qedera xwe.

Gorbihuştê payebilind li sala 1924an li şarê Silêmaniyê jidayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî û navendî li bajarê Silêmaniyê kuta kiriye. Li sala 1944an ji amojgeha mamosteyan li Bexdayê derçûye. Li sala 1946an di damezrandina Komara Mihabadê de beşdar bûye û li dibistanên wê mamostetî kiriye.

Piştî ku Komara Mihabadê hate rûxandin, wî li gel Mille Mistefa Barzanî, sînorên sê dewletan Îran, Tirkiyê û Îraqê derbas kir û gihîşt Yekîtiya Soviytê.

Roleke pakrewan Kerîm Zend e giring di dewlemendkirina çanda kurdî de hebû. Dora 40 pirtûk û bi sedan gotar di warên xaknîgarî û dîroka gelê Kurd de nivîsandiniye û belvbûne. Ji ber kar û xebata Kerîm Zend a pir hêja di temenê xwe yê dirêj de, ew bi "Xelata Mistefa Barzanî" hate rûmetkirin.

Li boneya goçbarkirina pakrewan Kerîn Zend, rêzdar Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê Partiya Demokrata Kurdistana Îranê peyamek bi boneya koça dawiyê ya mamosta Kerîm Zend belav kir û tê de wiha hati bû: ((Malbata rêzdar mamosta Kerîm Zend! Nûçeya dilêş a koça dawiyê ya mamosta Kerîm Zend dîroknivîs û coxrafîzanê Kurdistanê gihîşte me. Wî têkoşerê nevest, ji bilî çap û amadekirina hejmarek kitêb û mijarên têkildar bi hemû beşên kurdistanê, di her beşekê de hest kiriba ku xizmetek ji dest wî tê, pêşwazî jê dikir, herwekî çawa ku di serdema Komara Kurdistanê de, xwe gehande Mehabadê, û heyameke zaf di vî bajarî de wekî mamaostayekî di xwendingehan de, waneya zimanê Kurdî hînî dersxwanan dikir. Koça dawiyê ya vî kesayetiyê welatparêz û çalak cihê kovanê ye, her di vê derheqê de, ez sersaxiyê li malbata wî rêzdarî û hemû dost û nasyarên wî dikim, û xwe di xema jidestdayîna wî de hevpar dizanim. Mistefa Hicrî 11.10.2017

Bi navê rojnama Newroz û xwendevanên wê, rêz û rûmet ji axa gora gorbihuştê gewre Kerîm Zend re... Bila serê gelê Kurd xweş be.

# Rapirsî û Serxwebûn, Mafine Rewa Ne!

Rapirsî şêweyek e ji şêweyên bikaranîna demokrasiyê. Ji mafê her kes, civak û miletekî ye ku daxwaz, nêrîn û baweriyên xwe di warê pirsên jiyan û çarenûsa paşeroja xwe de destnîşan bike û bide zanîn.

Mafê çarenûsî yê gelan ji cenga cîhanî ya yekem de di rêgezên Wîlson û Şoreşa Lînîn de hatiye çespandin. Ji wan deman de, bi dehan belge, yase û zagonên navdewletî, navnetewî li derbarê wî mafî derketin, ew rewa dîtine, hemî dewletên cîhanê li ser erê kirine, hatine têkezkirin û Yekîtiya Netewan jî ew çespandine.

Li ber roniya rêgeza mafê çarenûsî, rapirsiya Kurdistana Îraqê û çespandina mafê çarenûsî ji bo gelê Kurd jî mafekî rewa ye. Ew jî li gora pîvan û rêzanên navdewletî û heyama şaristaniya nûjen tevgerî û rapirsiya xwe li dar xist. Çawa ku li sala 1925an, bi rêka rapirsiyeke (lipêwbanî) Wîlayeta Mûsilê (Kurdistana Îraqê) bi ser Qiraltiya Îraqê ve xistin, ma çima wê ne ji mafê gelê Kurd be ku bi şêweyekî aştiyane helwest û mafê xwe di çarenûs û paşeroja xwe de derbirîne?! Lê mixabin! Helwest û bertekên navdewletî yên tund û ne dadmend, nemaze jî dewletên herêmê derketin, baş diyar kirin ku hîn pir dem gerek e ta ku demokrasî û wekheviya rast li cîhanê.........7

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**